


Danhev û lêkdan
Mihemed Cezawîr

Ji Dastanên Ewînî Tawîr Begê Lawîn

Love epic



JI WEŞANÊN MALPERA KURDISTANCLUB

Mafên weşana vê dastanê ji nivîskar Mihemed Cezawîr re
parastî ne. ©

**DASTANA DILDARAN
JI FOLKILORÊ
GELÊ KURD**

"Tawîr begê lawîn
û
lewend pa a"

Danhev û Lêkdan
Mihemed Cezawîr Koçer

DIYARÎ

Ji ewê ko ez li ser baw û rêzikên Kurdî xudî kirime, bavê
Min Cezawîr Hesên Koçer re..

û ji ewa ko ez bi şîrê wê mezin bûm û bi zimanê Kurdî ji
min re dilorand, diya min Fêdana Brîm re..

M.C. Koçer

PÊ GOTIN

Mirov dîrokê dixwîne, lê dipirse, bi pey dikeve, da ko
ramana pêşînan û kevnariya dîrokê bi kar û serpêhatiyên
wê ve baş binase, lê xwendina dîrokê û pirs û peyketina
wê ne wek lêgerîn û lêkolîna wê ye, Lewra karnas û
kardîde û pisporên biyanî ji Ewropa, ji Asiya û ji dûr
welatan tên rojhilata navîn ji bo lêgerîn û lêkolîna dîrokê
bikin û kar û serpêhatiyên wê bibînin û fêr ramana
mirovê kevnar û pêşînan bibin û zanîn û hîn û zanahiya
wan rakin û têxin xizmetê gelê xwe.

Û mafir ko wilo dîrok girînge û wisa biyanî bi pey dikevin
û lê digerin û dixwînin, divê ko em jî wek wan vê yekê bi
serxin û peygerîna dîrokê bikin û vekolin û nedin
pişguhxistin.

Û weke ko ezman tijî stêrke her wiha dîrok zengîne bi kar
û serpêhatinan yên nayên jimartin.

Ne ko ez dixwazim têkevim nav şax û delavên dîroka jîn û
jiyanê, lê dixazim bêjim mirov kare ji ew şaxên dara
dîrokê hin pelan biqetîne, an jî hinekî av ji ber pêl û

delavên derya dîrokê vexwe. Êdî dîrok zanîn û zanahiyeka fireh û girînge û ramana pêşinan hêjaye da em bi peykevin û bixwînin û li ser kar û xebata wan lêkolînan çêkin û derxînin. Lê digel vê yekê de, kesî bi rastî kar û xabata gelê Kurd di lêkolînan xwe de yên ko li ser dîrokê çêkirine û derxistine xûya nekiri û ger xûya kiribin jî hindik, yan jî ne bi navê Kurd dane naskirin...! Ma gelo navê Kurd di dîrokê de nîne, lê karê wan ne hêjayî ko lêkolînyar bidin pesnê û bi bîr bînin...! Belê .. belê û bê gûman navê Kurd di dîrokê de heye û bi xêzek pehn û dirêj rewêştî û daxkiriye û kar û serpêhatiyên wan hêjayî pesnê û tîn bîran.

Nexwe divê ko xwendevanên me Kurd ji gelê Jiyanê tev de re vê yekê xûyakin. Û eger kes baweriya xwe bi vê gotinê yan bi wê xûyakirinê nake, em karin wê demê gawahiyeke mezin bidin diyarkirin û jê yek folkilorê me ye. Folkilorê gelê Kurd gelek dewlemend û zengîne û kar û xebata mirovetiyê di hemû warên jînê de kiriye. Çi di warê Zanîna jîna civakî û tor û weje û zimên de, çi di warê Ramana mirovetiyê û pêşketina wê û zanahiya jînê de û çi di warê çand û rewşenbîriya millet û gel de, ya ko em jê re niha dibêjin folkilor.

Dibêjin eger mirov bixweze miletekî naske, divê ko Folkilorê wî binase.

Û Folkilorê gelê Kurd nîşan û gawahiya dîroka wane. Û ji min reşve nayê ko lawekar û peygerîn û danheva folkilor zor dijawre, piştî ko min zanî sermiyanekî nirxidar û hêjaye mirov kare serê xwe pê rake û xebat û karê bav û bapîran bi sur û sertaca mirovetiyê ke di ev dem û nûjenê de. Folkilorê gelê Kurd gelek giranbiha û maldare bi peydabûna naveroka xwe ya levhatî û rengîn û têvel û daylan û delal, ji gotinên parzîndî, ji metelok û çîrokên xweş û geş û hunerwerî, ji rêzik û kevneşopên rind û xemilandî, ji stran û dastanên navdeng û sergul û sêrek, tev saz û awazên narîn û nazdar û pak û şêrîn û zelal, yên ko me dikin xewrojê û sibargeh û hiş û ramana

mirovê kevnar, da em bi tûmî paşmak û zikmakê xwe rakin û têxin xizmetê gel.

Bi rastî gelek kesan xwe westand di ber danhev û lêgerîn û birefkirna folkilor û wêje û çand û zimanê Kurdan de, ji wan kesan(Mîr Celadat Bedirxan,Dr.Kemîran,Ereb Şimo, Osman Sebrî, Nurdîn Zaza, Qedrî Can, Qenatê Kurdo, Reşîdê Kurd, Salihê Heydo, Urdîxan Celîl, Celîlê Celîl, Siyabend Cacan, Cîgerxwîn, Ezedîn Mistefa Resol).Û hinek din, tevî ko ji ew kesên xwe westandine û gelek kar û xebat di ber kêşayê gelê Kurd de kirine hinek biyanî jî hebûn, ji wan kesan ez karim navê(Iskender japa û Rojê yê Lîsko). Bi bîr bînim,ez wan tevan û hemî kesên xizmet ziman û folkilorê Kurdan kirine gelek spas dikim û silavên dilterî, perwerî, koçerî, Efrînî, folkilorî, û nûjenî ji dil û giyanê xwe de li wan dikim, Lê, belê em kerin bêjin ta niha danhev û lêkolînên ko li ser folkilor çêbûne û hatine der hindikin.

Bi taybetî folkilor ne rewşek hêsane bi gotin û pev û axaftinan mirov xûyake û bide nasîn.Lê ya rast ewe ko mirov ji bîr neke û kar û xebata herdem jê re bike û têxe nav destêd xwendevanên gelê xwe.

Ne daxwaza min ji peyvên pir ez pêşgotina vê dastanê dirêj bikim û bi dizî bidim pesnê bêtirî rastiyê. Tevî ko folkilor gelek hêjaye mirov pesnê wê bide. Lê weke ko xûyaye folkilor bi xwe pesnedara gele û bi cî kar û xebata millet tev baw û rêzikên wan ji me re wergerandine û anîne diyarkirn. Û ger çiqas mirov li ser folkilor binivisîne nikare mafê wê bi cî bike, ji ber ko folkilor bi pêkanîna xwe ya têvel û levhatî û şêrîn û şepale, mîna çiyakî bi dar û ber û çem û kaniye bi xwe bi ser zevî ketiye û bilind bûye.

Hêviya min bû ewe ko min ji mêj ve dixwest ez û keçek Kurd ji hev hezkin û ristên evîna xwe ji dildarên durist re bilorînin û rengêkî ji evîna Kurdî ji gelê Jiyanê re wek Mem û Zînê yan Ferhat û Şêrîne vepiçirînin û diyarkin.

Û çendî ez bi hesreta evînek pak û dilter bûm û gelekî jê tî bûm mîna ko lêvên gelê Kurd ji tîbûna evîn û viyana

Kurdistanê re miçiqîne, min bi dilgermî û dilxweşî, bi dilgeşî û dilnermî dastan û stiranek folklorî ji serpêhatiya dîroka gelê Kurd veqetand. Ev dastana hatiye nasîn bi navê Tawîr begê Lawîn (Mîr û Melayê Kela Rewendê). Û Lewend paşa Narîn(xatûn û xanima kela Mêrdînê).

Dastana Tawîr Begê Têrreng û zengîne, ji raman û wêneyên hunerwerî, xweş û ferîbende bi hîna fesanevî û rewîşt , dewlemend û qerpale ji zanîn û zanistiyê û felsefa naveroka wê, qenc û rind û xemilandiye bi hest û bêhriyên dil û giyan û mêjî, tewizî û têkûzkiriye bi rêzbenda pirs û peyv û gotinên helbestî yên serbestî û bêkêş û bi nazdariyek delal hatiye sazîkirin û awaz bûye.

Dastana dildaran bi çîrokek pir xweş dest pê dike û ramana yekemîn ji çîrokê Fesaneviye, ewe ko derhatina herdu hespêd avî û firre ji deryayê...

Di pey re çîrok dibe serpêhatiyek civakî di jîna Kurdan de û zanînen têvel û girîng di wê demê de ji me re xûya dike. wek baw û rêzikan, zanîn û felsefa ko tê de, zanahiya zanistî, hîn û bernamêyên perwerdeyî, sinc û rewşên xuristî û şaristanî û şenî, ta dawîya çîroka yekemîn û dest pêka stîrana dastanê, gava Tawîr Beg Lewendê Li serê Kela Mêrdînê di xewna şevê de dibîne û vê re camek eşq û meraqê dila vedixwe û kul û sewdayek evîni li dil û cîgerê wî dixê û dikeve pey şopa xewna xwe.

Helbet gelek ramanên rengîn û têvel di dastanê de hene, lê ez dixwazim xwendevan bi xwe têkeve pirs û lêkolînan û wêneyên vê dastanê û wêje û çanda kevneşop mêzeke û pê raman bibe û li ser raweste. Û berî dawiyê ez bi

dilekî ter û nerm û geş, spasiya dengbêj Bavê Seleh dikim yê ko ji min re bûbû jêderek bo danheva vê dastanê û alîkariya min baş kir, ta min ev dastan bi tûmî nivisand û ji dev wî bir. Û spasiyeke din ji her kesê ko bû egerek ji çapkîrin û derhînana vê dastanê re.

M. CEZAWÎR KOÇER
EFRÎN . ŞIYÊ
Avdar 2001

TAWÎR BEGÊ LAWÎN

Û

LEWEND PA A

Rokê ji rojê xwedê awcî û sekman bi hev ketin û bi hev ra çûn awê , li çol û deşt û çiya digerin , ji nişkava dîtî ewrekî reş ezman girt û ba û bapeşk û toz û telaz û bablîsk li hev gerî tev bahozeke û tavik baranê dirêj nekir, xuminîk hat û bû ure ura cil û cinewirêd çol û çiya û du pêl ji behrê rabûn, piştî demikê royê da çiya û deşta û keskesor hilhat, wê gavê awcî bi sekmanêd xwe ra got : Em herin wê çiyê ko her du pêlêd ji behrê rabûne, em sekin çî bi wê pêlina ra hat der ..! eger mal bê ê we, û can bê ê min, bi hev ra berve deryê çûn dehil û gez derbaz kirin û gihîştin ber deryê , du canî hespa dîn û anîn bajarê Mêrdînê, li bajarê Mêrdînê, dewletê girtin , sekirin ji dewletê ra nabin , xizmetî wan pire, du sim wan ê kê di avê da bin û dudu kê li hişkiyê bin û ew hespêd şevane..! dewletê li awcî vegeandî û awcî daxistin satî- bazarê û firotin, yek ji wan wekîlê mîrê Rewendê ji kurê mîrê xwe ra kirrî ,û ê din di stranê da xûya dibê ..

Li bajarê Mêrdînê paşak hebû, xwedê law ne didanê, millet û xanedan û rêberê bajarê Mêrdînê jê ra digotin : jineka xwe din bibi ji bo lawê te bibin û tu kûrûcaq nemînê, paşa digot: Ez pir ji pîreka xwe hezdikim û çê na bê ez jineka din bibim, rojikê jina paşê

keçkik anî, paşê pîrik û carî û hemî kesê li dor wan hene
temi kirin û ji wan ra got: wî nê li nav bajarî Mêrdînê
bibên lawikî paşê bû û yekî pir çelengi û paşê navê wî
Lewend lê kir ..? piştî heft sala paşê heft mile wesandin ji
bo Lewend li ber destî wan ho û zane bibê Mila heft sala
bi zanahiya xwe Lewend elimandin û piştî wê bi paşê ra
gotin : Hemî zanehiya bi me ra me da lewend, paşayê
mêrdînê kitabê milan jê standin û tûrê wan jê ra tiji
zêr kirin û verêkrin .

Piştî demikê paşayê Mêrdînê mir . Rêber û
xanedanê Mêrdînê li hev civîn û gotin : Em kê bi paşayê
xwe kin ? piraniya wan gotin: Bila kurê wî, Lewend,
paşayê me be ; Rabûn û çûn cem Lewend û gotin : Me tu
kir paşayê xwe . Lewend got: Ger wî dixwazin ez paşayê
we bim , wî nê li ser zinarî Mêrdînê î ji su gazî, kelak ji su
gazî bigrin û çel û yek carî û xelawîr li ber destî min
dînin. Rêber û xanedanê Mêrdînê daxwaza Lewend pêk
anîn û biser wê çelengiya xwe da Lewend bû paşayê
bajarî Mêrdînê.û li vir Lewend paşetiya xwe dibînê û li
kela rewendê Tawîr begê lawîn dibê mîr û mileyê kela
Rewendê û rojikê keçkek çeleng li siya zinarê kela
Mêrdînê di xew da dibînê û bi pê xewna xwe dikevê
û ji vir û pêda dibê stiran.....

Lê Lewendê lê yarê
Lê ..lê..lê..lê..lê yarê

Tawîr begê lawîne
Law law law law .. lawîne
evê li rojê dixîne
Rojê li evê dixîne
Tawîr begê lawîn
Lewendê di xewa eva da
Lewend pa a li serê kela Mêrdînê dibîne

Law law law law .. dibîne
Law law law law .. dibîne

Dibînê li serê kela Mêrdînê
mûm û fenerê vêxistîne

derî û pencerêd kela Mêrdînê
li lawkê lawîn vebûne

Law law law law .. vebûne
Law law law law.. vebûne

Bi Lewendê ra camik
e q û meraqê dila
vedixê û vê ra dibê
kul û sewdak
dila xemîne

xwedê çiya didê û berfê lê dibarîne

dilî me ra ne wek çiyakî
bi berf û bi mij û bi dûman be
her dilek nikanê
vê kul û sewda yê rakê
û hilîne

Law law law law.. hilîne
Law law law law.. hilîne

Vê kul û sewda yê
ferz û sinetê ji lawkê lawîn
birrîne

ê vê kul û sewda yê
ferz û sinet ji lawkê
lawîn birrîne

lê lê lê lê lê .. yare
lê yarê ez nemînim
vê carê

Xatûnê..
Sermestê..

yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide ba yê êvarê

Erê çiqas rojê Xwedê hene
Tawîr begê lawîn azana sibê
li serê kela Rewendê dixwîne

li pî a mirûdê xwe diskinê
himî a iqe himî sewdaliye
himî seydaye himî mileye
li dîwana Xwedê
destê xwe girêdide
du riketa dikê û çara ji
derdî yarê ra ji bîr dikê
sîwar dibê li çapqînê
çolî, be î, gergîne

Ban mirûdê xew dikê dibê :

kê ji we bajarî Mêrdînê
bi çavê serî xwe diye..?

Ezê herim bajarî Mêrdînê
sewdak dila li serê mi xistiye
min bihîstî li bajarê Mêrdînê
hekîmikî derkêtiye jê ra dibêjin
hekîmê Sato
hemî dermana çêdike
û ji derda ra dibîne

Law law law law .. dibîne
Law law law law .. dibîne

Wê çaxê sîwar dibê li çapqinê çolî, be î, gergîne

toz û telaz bi pê dikevê, kevir
û kuçik ji ber lingêd çêpçûn
diçûne

di gaza Yaqûbê ra dadikevê
me ra nizanê di erdê ra derê
lê di ezmên ra difirîne ...!

li serê kela Mêrdînê
Lewend pa a dibîne

sê rone sê evine
Lewend pa a
li gaza Yaqûbê çavê xwe
vedikê û digêrîne

Tawîr begê lawîn
xwe bi ber kela
Mêrdînê digîne

Law law law law .. digîne
Law law law law .. digîne

Eger yarê me ra tinebin
Bila me ra kûr bibe û nemîne

Lê .. lê .. lê .. lê

lê yarê
ez nemînim vê carê

Xatûnê ..

sermestê ..
yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide bayê êvarê

Erê Tawîr begê bankir go :
law pa ayo dilî mi liyane

ezî ketime pê opa xewnek
evane

li serê kela Mêrdînê mi vê ra
vexwerî camik e q û meraqê dilane

ez nizanîm ..!
cih û war û edresa wê kijane

eger xwî ka te ye..!
ya dotmama te ye..!
tê ûrikî li îstê mixê
mi bavê kêla kevirî
û axa gornane

ya tê sozê bi mi dê
meraq û e qa dilane

min bihîstî li bajarî we yî Mêrdînê
hekîmekî derketîye
hekîmê Satoye
wek hekîmê Luqmane

bila ji vê derdî mi ra bibînê
çare û dermane

lê lê lê lê ..yarê
lê yarê.. yar nemînê vê carê

Xwetûnê..
Sermestê..
yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm îez ji balav û dindarê
hele yarê .. bide bayê êvarê

Pa ayê Mêrdînê bankir go:
law mîro ! hatina te û çêpçin va
li ser dil û çavane

êvare demê ketî yasiyane
bajarî me yî Mêrdînê
bajarîkî kevnare
pîrî pane

tu nizanê çiqas xan
û meyxane tê da ne

ji vira heya siltanbazarê
ji siltanbazarê heya satibazarê
ji satibazarê heya kolanxarê
ji kolanxarê heya xanbêtarê
ji xanbêtarê heya toranxanê
ji toranxanê heya çiftexanê
qereqol û payvana girêdane
tu winda bibê...!
kî yê li te bibê xudane.. ?

Tu were sî û du hekîm û bijîkê
bajarî Mêrdînê di bin
fermanê mi dane

tu î ev were ! li min bibe mîvane
ezê ji derdî te ra bibînim
çare û dermane

lê yarê .. yar nemînê vê carê

Xatûnê..

Sermestê..
yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide bayê êvarê

Wê çaxê
Tawîr begê
zextê xwe derxistin
ji cotê zengiyane

çapqinê çoli be birin
tewla hespane

yêm û yêmekê çêpçin didanê
lê sist kirin qolane

didan ber tapan û qa axane

û bi hev ra derketin
di nêrdewana ra
serê kela Mêrdînê
çi yayle û zozane

pa ayê Mêrdînê
çel û yek xelawîr û carî qewitandin...!
ser xudiyane..!

pa ayê Mêrdînê û Tawîr begê va
bi tenê li ser kela Mêrdînê dimane!

pa ayê Mêrdînê digo :
ezê Lewendê li te bikim mîvane

eger tu naskê
xewna xwe ya evane

û tu nas nekê
tu ne milakî
bi du pere nîvane

Law law law law.. nîvane
Law law law law.. nîvane

Law dilo dilê mi dîne

ax nemawo dilê mi dîne

de were Lawend pa a
xelkê minî nazikî narîne

wê çaxê dikê û dilezîne

derê pi çît û perda û koza
cil û mitêla mîra
Ji bejn û balavê datîne

Kirasekî, herîrî, tenik
bi ser bejn û balavê dixîne

kirasê Lewendê rengîne

çiqas gul û çiçek û kulîk
li darî dinyayê hene
bi rengê xwe tê da
vêbûne

bejn û balava wê dikenîne

ev kirasa
bi destî tera a

ne hatî birîne!
û bi destî terziya
ne hatî dirûne!
daneketî devî çar imazata!
ne hatî firotan û ne hatî kîrrîne!

hîn ti xatûn û xanima
esmer û zeriya
li bejn û balavê xwe ne dîne!
kirasekî pir teniki
navbera çiftê zo yê memika
û sîngê kalî gewr va
ji dûr va ji dûr va
dixewîne

Law law law law..dixewîne
Law law law law..dixewîne

Ji wêda tê Lewende
xelkê nazik û narîne

li ser pozî qundirak landilîne

mêx û kerik û gupik zêrîne

êlkan û firqata bayê xerbî
li serê kêla Mêrdîne
li bejn û balava wê
dixîne

bejn û balava Lewendê
mîna qamî ekî ekirî
ji ser û pê da diçelqîne

eniya kal û gewre
wek stêrka perwîne

û bi dîmê xwe yî gulîne

pelê dîmê Lewendê wek çîçeka
em Kurmanc vê ra dibên yasema
xelkî me yî Soran
dibên yasemîne

û lêvêd xwe tenikin gangulîne

diranê xwe hûrin
wek tolî û zîpikê
li ser çiya barîne

qirika xwe weke qirika
ordek û qaza
bostik û çar tilîne

çavêd re û belek
hîn qelem î kilê û kildanê
nedîne

bi gotinê dengbêj û kilamciya bê

Xwedê bi xwe
daket bajarê Mêrdînê
li siya zinarê
bi qelemê lewhê mehfoz
xet û xêz jê ra çêkrine
bi wî qelemî
biri û bijang ki îne

Law law law law .. ki îne
Law law law law .. ki îne

Eger yarê me ra ne hanabin
Bila me ra kûr bibê û nemînê
Lê..lê.. lê ..lê

Lê yarê.. ez nemînim vê carê
Xatûnê..
Sermestê..
yarê te mey vexwere
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide bayê êvarê

Wê çaxê Lawend pa a
dikê û dilezîne

biskê xwe vedikê û vedir îne

biskê Lewendê bi rengê xwe
sorî sîsinîne

di nav berê mil û pêşira ra daketine derbaz kirine nav
kêla kilît û kembera li bejn û balavê hêwirîne

û du zulfê jê veqetîne

li gerden û gihara alîne

sî û sê pi kova ji sîngê kalî gewr
vedikê û vedijîne

sîngê Lewendê
sîngikî sipiye nazikî nazanîne

weke berfa li serê çiya
ji salê heya dawiya salê dimîne

pelê sîngê Lewendê hîn
ne gopilîne
hîn tu xoca, tu caziya,

tu cadîbaza
kaxet û wereq û hic û pezwendê
jê ra ne kirine qelem û divîtê xwe li ser danenîne

di sîngê kalî gewr da
zo yê memika weke sêva
sorin û him sipîne
memikê lewendê
bê agirê sewdê zengirîne

serî memika wek
çîçekê henêr û tenê tirîne

memikê Lewendê
ter û tîrfendene
hîn tili û pêçî bi memikê
xelkê narîn ne bûne

Law law law law .. ne bûne
Law law law law .. ne bûne

Tawîr begê lawîn
li hembera Lewendê
maliq dimîne

hi û aqil di sêri da namîne

nikanê vê ra bidê û bîstîne

heya dawiya evê
bi lewendê ra dimîne

law law law law.. dimîne
law law law law.. dimîne

dibê :

lê yarê ..
ezê berê xwe bidim
kela Rewendê kes tine
li ûna min azana sibê bixwîne

ezî derim bi xatrê te bê
ez kê herim

tidarekê min û xwe va bibîne

dakeve tewlê
gep û lîwanê çapqûnê
çolî be li dêv xîne

zînê bi rêsa li ser dîne

qolanê bik îne û bi tîne

ji serê kela Mêrdînê daket
Tawîr begê lawîne

sîwar bû li çapqînê
çolî, be î, gergîne

berê xwe da kela Rewendê
wê kê her rê azana sibê bixwîne

Law law law law.. bixwîne

Law law law law.. bixwîne

Xatûnê..

Sermestê..

yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndare
hele yarê bide bayê êvarê

Roj bi rojê Xwedê
tawîr begê lawîn tê kela
Mêrdînê
kêf û meraqa dila
bi lewendê ra dibîne

Law law law law.. dibîne
Law law law law.. dibîne

Lê ti roja
li cem lewendê heya sibê
dîleg û mirazê xwe vê ra nabîne

rojekê ji kela Mêrdînê bi rêket
Tawîr begê lawîne

Lewend pa a
di pê Tawîr begê ra
bi wê e q û sewdayê dimîne

li pozê kela Mêrdînê
derê û tê
çavê bi istir û girîne

rakirî çoyê e per
derê û tê
li pozî qundira dixîne

royê bi rumekê û dudiya hilhatî di ser çayê Gure ra dayî
serê kela Mêrdînê
istiyê mi bi kê
hîn çavê Lewendê
xewa sibê nedîne

lê yarê.. ez nemînim vê carê

Xatûnê..

Sermestê..
yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide bayê êvarê

Wey dilo
dilê mi li yane

bajarê Mêrdînê
xela bimînê bi dîkane
di bin ra girtî mije
di ser ra bi dûmane

li orta bajarê Mêrdînê
pêda bûye pîreka
por hi îne kopîçrane

mala pîrê bi ewitê..!
bûye zareta bawiya û tawiyane

keçikêd bajarî Mêrdînê
li dor pîrê kombûne û civiyane

li dor pîrê girtine
govend û dîlane

bext û dîlegê li wan ikiyane

dibezin
dest u lingêd pîrê
kincê pîrê diqetînin..!
di ser çavê xwe didane

ji xwe ra kirine tiberk û dermane

hêski û keski
bi pîrê va nemane

li orta bajarî Mêrdînê
pîr dimînê cîblaq û uriyan

Xatûnê..

Sermestê..
yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide bayê êvarê

Law dilo
dilê mi dîne

îro li orta bajarî mêrdîne
pîrika sofîye, hecîye,
ji Mekê û Medîne derketiye
li ûna hecaciya dimîne

bi ser xwe da berdayî
fîstaneke keske desmal
û çewre sipîne

bi desda tizbiyê begda ane
hûrik hûrik dik îne

û di bera ismî ezem dixwîne

pîr ji kê mayî
kes ji pîrê nemîne..!

Xwedê ûcaqî pîrê vemrîne
cadûbaz û kopîçranek por hi îne

eger yekî zanabê li pîrê binirê
perde feyê û heyê û hecabê

ji rû yê pîrê qetîne

Keç û bûkêd bajarî Mêrdînê
pîrê dibînin

li pîrê kom dibin û digînin

dibezin dest û lingêd pîrê
yên dest û lingêd pîrê
bi des nakevin
pariya ji kincê pîrê diqetînin

Ji xwe ra tiberk hiltînin

dibên belkî Xwedê rebî alemê
bexta li me vekê em jî dîleg û mirazê xwe bibînin

li devê çar imazatê
bajarê Mêrdînê
pîra sofî cîblaq dimîne

Pîrê bi dengikî bankir go :
ez pîrim pîrika we dînim

ez hecîme hecîya we dînim

eger ez qêrinîkê bibêm
ya ematakê bik înim

ezê bajarî Mêrdînê
ji ser û bin da
li serê xwe kom bikim
û bicivînim

agirekî berdim
bajarî Mêrdînê
bi ewitînim

ezê kêvir ji ser kêvir

bêxînim

eger dilî mi bixwazê
mirazî du dila
ezê di kêlîkê da
bi hevgînim

dilî min nexwazê
ezê di nîv kêliyê da
ji hev biqetînim

ez tuf dengizê dikim
ji ser û bin da
dihermînim

bi heft kêndira dilîzm
bi çel û yek dîla
dixwînim

ez navbera dila dibînim

Xatûnê..
Sermestê..
yarêê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide bayê êvarê

Erê Lewend pa a
li serê kela Mêrdînê
dengê pîrê dibîsê û dibîne

Li çel û yek carî û xelewîra
qêrînîkê datîne

dibê wîn bikin û bilezînin

xwe berdîn devê çar imazatê bajarî Mêrdînê
vê pîrê rakîn
û hilînin

di çel û yek nêrdewana ra
bi derînin

ezê istîyê we bi kînim
eger lingê pîrê derec û nêrdewana bibînin

Çel û yek carî
dîkin û dilezînin

xwe berdidin
devê çar imazatê bajarî Mêrdînê
xwe li ortê hev dixînin

û rê ji hev distînin

pir u hindik di ber derî û nêrdewana da dimînin

dadikevin devî çar imazata
pîrê radîkin û hiltînin

di derec û nêrdewana ra
pîrê bi dertînin

lingêd pîrê nêrdewana nabînin

li serê kela Mêrdînê
li pî a Lewend pa a datînin

Lewend pa a
dike û dilezîne

çoyê e per
bi des xwe dixîne

çel û yek carî û xelawîra diqewtîne

cariyeke kinik !
ji tirsê Lewendê ra
lêvê lê peqîne
kab û kulîyê lê ikîne
xwe davê bin kerewît û masa
tê da dimîne

Lê lê lê lê..lê yarê

lê yarê..ez nemînin vê carê

Xatûnê..

Sermestê..

yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide bayê êvarê

Law dilo dilê mi dibêye
ax nema yo dilê mi dibêye

Lewend pa a
derê pa koz û perdêye

li ber darê beden eynesiyê
derê û tê ye

bejin û balavê
didê ber çeke dûzanê
xeml û xêzêye

bi bejn û balava bûkinî
bi ser pîrê da di tê ye

bandikê.. dibê :
Lê pîrê lê sofiyê lê heciyê
Lê cadîbazê
tu kê çi dermanî
li canê minî narîn bikêye

bila rojekê ji rojê Xwedê
Tawîr begê lawîn
bi mir ra bimînê

heya ta tiya têkevê
kêf û meraqa dila
mirazê xwe bi mi ra bibîne
ezê li ser destê xwe
lawkê lawîn têxim
xewa sibêye

mila mal û mewalî
bajarî Mêrdînê tev da yê te bê
ezê li ser te bi derînim
mila serê min bixwê

ji mi bimînê li darê dinyêye

Lewendê hemî nî anê bajarê
Mêrdîne bi texêye

lê lê lê lê.. lê yarê
lê yarê ez nemînim vê carê

Xatûnê..

Sermestê..

yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide bayê êvarê

Pîra sofî go :

pa ayo

çayêd bilînd bê ba nabin

geliyêd kûr bê av nabin

hespêd çê bê sîwar nabin

rînd û çeleng bê yar nabin

bax û baxçe bê gul nabin

malêd bi kew bê dew nabin

pîra sofî dike û dilezîne

tûrê kitaba bi dertîne

têr ra derê tê û dixwîne

li ber zinarê Mêrdînê
agirekî pêdixîne
erê bîhna pixûrê
bi ser kela Mêrdînê dixîne

çavê Lewendê
wekî gulî xwîne sorbûne

çavê Lewendê
bi istir û girîne

lê lê dîne dîwanê
sermestê qaf giranê

derdî dila nizanê

pîr bi derdî te kanê

Sato ti tî nizanê

lê lê dîne dîwanê

Pîr dibê:
Lê Lewendê
ma kêlik xo û cihe
li ba te nayê dîne

têxe biro ê ji çapqûnê
çolî, be î, gergînî ra bikelîne

û di afirê çapqînê
lawkê lawîn da dîne

ger sîwarê çapqînê çolî be hat

Tawîr begê lawîne

çapqinê çolî be
wê ne bide û ne bistîne

wê çaxê
Tawîr begê lawîn
li kela Mêrdînê yê tim û tim
ji te ra bimîne

yê bi rûre bê
xwe li mirûd û mileyê
kela Rewendê namîne

law law law law.. namîne
law law law law.. namîne

Lewendê go :
lê pîrê Xwedê ûcaqî te vemrîne

eger ez çapqinê, çolî, be î bikojim
Tawîr begê lawîn
wê bi ûrê nêrizî
istîyê min bifirîne

kela Mêrdînê
wê bê mîr û pa a bimîne

Lewend pa a
çoyê e per bi des xwe dixîne
dî çel û yek nêrdewana werdikê
pîr ne dide û ne distîne

ber ve axreta kera di îne

cariya kinik û cûre
dî bin kerewît û masa da
dibîsê û dibîne

gotina pîra hecî hiltîne

Xatûnê..
Sermestê..
yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide bayê êvarê

Tawîr beg sîwar bû
li çapqinê, çolî, be î, girê

kevir û kuçik
ji ber lingê çêpqûn vedipekin
toz û telaz li hev digêrê

de t û çiya derbaz dikê
çol û bêlana dibirê

di gaza Yaqûbê ra dadikevê
basik mezinê difirê

sê rone sê evine
Lewendê li ser kela Mêrdînê
dînêrê

wê çaxê
yêm û yêmekê çêpqin
bi xwe ra radikê û hildigirê
dadikevê pî a lawkê lawîn
bi serê çêpqûn digrê

Tawîr begê
bi dengikî bankir go:

Lê lê lê lê.. lê yarê

ez bi qurban gul û giharê

kul û derda dlî me xwarê

ez nemînim vê carê

aman yarê ez nakim

aman dostê ez nakim

ezî tobedarî sûndxwarîme
hespê xwe bi destî yar û dosta
êm nakim

Lê lê lê lê.. lê yarê

Xatûnê..

Sermestê..

yarê te mey vexwarê
têr nebûm ez ji balav û dîndarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
hele yarê bide bayê êvarê

Tawîr beg peya dibê:
Ji çapqinê çolî, be î, gergîne
çapqinê xwe bir tewla hespa
û bi destê xwe xizmetê çêpçûn dibîne

law law law law.. dibîne
law law law law.. dibîne

bi hev ra derketin
serê kela Mêrdînê
qonaqa rengîne

bi Lewendê ra meraqa dila dibîne

Xwedê mala cariya bi cûk
bi sêri da bi ewtîne

derê kêlek xo û cehe
li hev dixîne

dikê qazkê û dikelîne

di afirê çapqinê
çolî, be î, gergîn da
datîne

çapqûn ne didê û ne distîne

law law law law.. distîne
law law law law.. distîne

Tawîr begê
bi dengikî bankir go:

Lê yarê
tu rabe nav û tengiyê
çêpquîn bik îne

ji gavî çû da ez nizanim
çi kê werê serê min û çêpquîne

ê ek û ewatîkê
di canê mi da tê dîne

ez xilma dibim
ez dibînim çapqînê minî
bê zengiye û bê zîne

ez nizanim
çi telam û çi belaye
wê min û çapqîn bibîne

wê çaxê
Lewend daket
ji kela Mêrdîne
ji qonaqa rengîne

bi rê va cariya kinik dibîne

vê ra dikevê peyv û gotina
carî ber Lewendê tê dibê:
min çapqînê Tawîr begê ku t
bila sîwarê çêpquîn
ji te ra bimîne

law law law law.. bimîne

law law law law..bimîne

wê çaxê.. Lewend
qêrinîkê li çel û yek cariya datîne

çel û yek xelewîra
li serê xwe kom dikê û dicivîne

çel û yek xelewîr û carî
dikin û dilezînin

xwe berdidin tewlê
çêpçin ji tewlê bi dertînin

di ber ra digrîn
istîr û rondika
dibarînin

li tewlê digerin tu hespa li bîçma çêpçûn nabînin

Lewend û çel û yek cariya
derin tewlê seqeciya
bergîrikî bi rengî
çêpçûn dibînin

bihayê wî bergîrî ne heft kîsin bi hey t kîsa distînin

tînin
li tewlê çêpçin girêdidin
zîn û zengiyê çêpçin
li ser datînin
lîwanê çêpçin
li dêv dixînin
Xatûnê..
Sermestê..
yarê te mey vexwarê
vere ne biskê xwe yên bin arê

têr nebûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide bayê êvarê

law dilo dilê mi dîne
ax nemawo dilê mi dîne
ela dilê mi bi ewtê
dilikî we dîne

ji kula da bi kule
ji birîna da bi birîne

law law law law.. birîne
law law law law.. birîne

ji kela Mêrdînê bi rêket
tawîr begê lawîne

destê xwe kir destêd bi hene
zendêd bi çîne

daket ji kela Mêrdînê
gesra rengîne

yar ji tirsaxwe ra
dîbezê serê çêpçûnê

ji çapçînê çolî be ra
qolanê di tîne

were vê fermanê
Tawîr beg
çava li çêpçûn hilnîne

ling û zextê xwe

kirin zengiyê çêpqûne

Tawîr begê lawîn bankir go :
lê yarê...
eger ez vê heftê ne hatim
tidarekê min û xwe heftê tê bibîne

rê ya kela rewendê dikudîne

ê kê herê kela Rewendê
azana sibê bixwîne

lê yarê.. yar nemîne vê carê

Lewendê bankir go :
Cariyê lê dîne
lê tu nizanê
Tawîr begê lawîn
ê werê serê mi jî bifirîne

lê nezanê lê zalimê lê bîlmezê
çima te we kir

te mala min ji ser û bin da xerakir

te hi ê min belav kir

te risqê lawkê lawîn
ji mala mi rakir

te Tawîr begê lawîn
li çol û çiya windakir
te gotina pîra sofî avakir
Lewendê bi destê xwe
cariya kinik bi dar da kir

lê lê lê lê.. lê yarê
lê yarê.. yar ne mînê vê carê
Xatûnê..
Sermestê..
yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide bayê êvarê

law dilo dilê mi dîne
lewend pa a dike û dilezîne
çavê Lewendê bi istir û girîne

Lewend pa a fermanekî
bi dertîne

dibê :
de bigrin derî û pencerêd
kela Mêrdînê

bila Lewend pa a
di kirasê êsîriyê da
lawkê lawîn nebîne

de were min
û tawîr begê lawîne

royê bi rumikê û dudiya hilhatî
Tawîr beg li ser kaniya qerarê dimîne

Çapqînê, çolî, be î,
westiye ne didê
ne distîne

çiqas didê ber zengiya
xwe ji ci nalivîne

Tawîr begê
bi dengikî bankir go:
law çapqino
tu çapqinê minî kabkurî

ez nizanim
yarê yêmê te rakirî

law çapqino..!
ez nizanim
tu birçiyî tu ne têrî

tu xêre..!
ji kul û kedera dilê mi ra nafirrî..?

Tawîr begê lawîn peya bû
Hûrik.. hûrik
li dor çêpqûn digerî

êstir barandin
bi ser da dagirî

law law law law.. dagirî
law law law law.. dagirî

go :
Law çapqino
tu çapqinê minî çolî be î

ez nizanim
wekê mi tu a iqî
nizanim serxo î

ez nizanim
tu wekê minî
bê aqil û bê hi î

Ji gavî çû da te didim ber zengiya tu name î

te di dil û cîgerê mi da
çêkir sed xiro û piro î

ez nizanim
tu bêmarî law çapqino
tu nexwe î

te ez ne gihandim
keka Rewendê
li pî a mirûda
kirim rûre î

Wê çaxê
Tawîr beg peya dibê
ji çapqinê çolî, be î, gergîne

li pi xwe dinêre gîhî tî
kaniya Qerarê
û kela Mêrdînê jê va
dixewîne

dibîsê xocê Mêrdînê
azanê dixwîne

wê çaxê berdehê çêpçin
ji ser datîne

ê kê xizmetê çêpçin bibîne

hekîm û bêtara lê bicivîne

di dor çêpqûn ra digerê
ciyê qû û hemala lê dibîne

naskir ne çapqînê çolî, be î, gergîne

Tawîr begê ûrê nêrizî
dik îne
û her çar lingê wî bergîrî difrîne

Mîrê kela Rewendê
li çol û çiya peya dibê û dimîne
law law law law.. dimîne
law law law law.. dimîne
berdehê çêpqin li ser
mil û pêsîrê xwe datîne

berê xwe didê kela
Mêrdîne qesra rengîne

mala bavê Lewendê bi ewitê
derî û pencerêd
kela Mêrdîne girtîne

Lewend pa a
peyakî ber Tawîr begê
ji tîrsa xwe ra di îne

Tawîr begê ji dor
kela Mêrdîne
diqewtîne

sê rone sê evine
Tawîr beg
zîne çêpqûn û berdehê
li devî çar imazatê

bajarî Mêrdînê digerîne

Bazarganikî yawdî
lawkê lawîn dibîne

her berdehê dadixê
herac û mazatê
yawdîkî zalime
bihayê berdehê
û zîna çipqûn
di kîne

çiqas delalî bajarî Mêrdînê hene
kes bêtirî yawdî kîs li ser dananîne

berdehê çêpçin
tevda bi zêr û zîv kutayîne

Tawîr begê bankir go:
Law yawdiyo ev çi fermane

ev çi dem û dewrane

hey malê te xirabo
bi te ra tine ne
însaf û ne wîjdane

erê çel û yek kîsê te
ne bihayê cotê zengiyane

li orta bajarê Mêrdînê
te berdeh û zîna çapqînê çolî, be , kir erzane

te ji min bir bi talane

wê çaxê

berdeh û zînê ji yawdî ra dëlê
û radikê çel û çar kîsê zêrane

dikevê nav bajarî Mêrdînê
devê sûk û çar iyane

bajarî Mêrdînê
bajarîkî pîrî pane bi dîkane

di ser ra girtiye mij û dûmane

Tawîr begê lawîn
dikevê gedûka darte ane

çavê xwe li dîkanekê dikevê
dibîne tembûrê tê da bi dar vane

hemî tembûrêd li wê dîkanê hene
bi çarde perdane

Tawîr begê lawîn
tembûrikê jê dixwazê
bi sî û du perdane

tembûrcî dibê :
law a i qo sewdaliyo
tembûra tu dibê
Ne mi dîne û ne cara mi girêdane

Tawîr begê vê ra got :
law sazbendo
ji te çêkirin û ji min girêdane

erê lawkê lawîn
çedikê ser tembûrcî
li ûnê kîsikî çel û çar kîsane

Tembûrcî bi xwe ra got:
ya ev a iqe
ya jî sewdaliye
ya jî xerîbikî nezane

radibê li ser tembûrê rûdinê
sê roj û sê evane

Tawîr begê lawîn
ji kêfê dilê xwe ra
girêdidê sî û du perda
û çar têlane

erê ji wê û ûnda
çiqas tembûrvanî
bajarî Mêrdînê hene
li wê tembûrê kom bûn
û civiyane

gotin:
law sazbedo
bike û bilezîne

qeda û belê xwe li canê me xîne

ka ji me ra biçîkê lêxîne

Tawîr begê lawîn
çagira darê tembûrê radikê
û koda wê di kevçika dilê xweda datîne

hûrik hûrik derê û te
lê dixîne

necarê Mêrdînê
li tawîr begê malîq dimîne

Tembûrvanêd bajrî Mêrdînê
wek wî bi carîkê nedîne

ji wê bi ûnda lawkê lawîn
bi rêdikevê û serê xwe hiltîne
Law law lawl awl.. hiltîne
Law law law law.. hiltîne
Xatûnê..
Sermestê..

yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide bayê êvarê

de were Tawîr begê mîrê kela Rewendê lawkê lawîne

ji ivan û gavanê çola ra
li tembûrê dixîne

li ser xwe û Lewendê
kilamikê çêdikê û bi dertîne

her carê xewa xwe tê
tembûrê li ser dilî xwe datîne

Berê xwe ber kela Rewendê didê û digerîne

digîne kela Rewendê
heval û mirûdê xwe
lê kombûn û civîne
law law law law.. civîne
law law law law.. civîne

Tawîr beg ji derdî yarê
û çapqînê, çolî, be ra
dikevê nav ciya bi nivîne

kes nikanê li kela Rewendê
ti çare û dermana ji
lawkê lawîn ra bibîne

ji derdî Lewendê ra
tawîr beg salikê û e miha
nexwa iya giran dik îne

bi mirûdê xwe ra dibê:
derdî mi e qa
Lewend pa aye
xelkê minî nazikî narîne

ji wê û bi ûnda

Tawîr beg derdikevê
ji kela Rewendê
serê xwe radike û hiltîne

berê xwe didê
kela Mêrdînê
cem Lewendê qesra rengîne

digînê ber kela Mêrdînê sedikê
ivanikî bi pîkê kilma
Tawîr begê lawîn
didiyê û dilorîne

di ser ra derbaz dibê
nêzîkî kela Mêrdînê dike û dibîne

govend û dîlanika fereh digêrê
û bi seda kirîfê li dorê civîne

li ber çirûska agirikî
kom bûne, hêwirîne

law law law law.. hêwirîne
law law law law.. hêwirîne

Xatûnê..
Sermestê..
yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide bayê êvarê

Tawîr beg ji kirîfa dipirsê, dibê : Ev çi dîlan û govende ? û ji bo kê ye ? Kirîfikî jê ra got :ev dewat û govend a şivanê Lewend paşayê kela Mêrdînê ye. Tawîr beg pirsî: Ma kînga wîn kê vê def û dîlan û govendê bozmişkin? Kirîf got: law sazbeno te ji mi ra got ji kesî din ra ne bêje ! ger kes bibîsê tu qala dawîya vê govendê dikê ê xeberê bi Lewend paşa din wê serî te bidê ber daraxaçê ! ev ket roja çel û yeka govend digere û tu dev û lêv bi me va nemane û kes ne wîrê bipirsê kengî dawîya vê dîlanê ê werê. Tawîr beg ji kirîf pirsî : Ma paşayê kela Mêrdînê tê sêra vê govendê lê na ? kirîf jê ra got: Erê her roj ber destî êvarê Lewend paşa tê dikevê serî dîlanê û stranek xwe dibê û tê da dibêje : Tawîr begê lawîne rojê li şevê dixîne şevê li rojê dixîne û piştî wê derê qesra rengîne û kes nizane ew çi strane û li ser kê dibêjê .Tawîr begê ji kirîf ra got : ger paşayê we hat dîlanê xeberê bi min de ez jî stranek xwe bibêjim belkî tiştikî bi min dê .

Hat dema êvarê Lewend paşa dadikeve ji qesra rengîn kela Mêrdînê xwe berdidê serê govend û dîlanê carekê dîlan digere kirîf ber Lewendê derê û dibê : kirîfikî ji dûr welatikî xerîb hatiye bajarê Mêrdînê dixweze ji te

ra bikê saz û kilamikê û çî ji destê te hate der tê pêdê û bi
rê kê Lewend paşa ferman da kirîf û kirîf ban Tawîr begê
kir got: Lewend paşa dixweze tu sazêkî jê ra bêje, wê caxê
Tawîr begê lawîn çû orta dîlanê ber Lewendê hêdî hêdî
nirrî û bi saz û dengê xwe nêzîkî wê bû[xwe bi serî kaba
berda pîşa Lewendê bi des da tembûra ji sî û du perdane
û lêxist li çar têla û hat ser strana Lewend paşa û got
:Tawîr begê lawîne rojê li şevê dixîne şevê li rojê dixîne û
piştî Tawîr beg di perdên tembûrê ra çû û hat bankir go:

lê lê lê lê .. lê yarê
lê lê lê lê.. lê yarê

Tawîr begê lawîne

sîwarê çapqînê
çolî be î gergîne

gava sîwar dibe
ji kela Rewendê
qonaqê sê miha
sê seta hiltîne

hildik ê qonaqa dalibegiya
li siya zinarê
meraqa kêf û dila dibîne

li ser masan û texta
bi lewendê ra muhbeta dibîne

lomekarino loma mekin
derdê e qê derdekî girane
gava navê Tawîr begê hildidê
diber tembûra wî ra derrê û tê
xwe dilivîne

Tawîr beg lawkê kele e

lê yarê lawkê kele e

sîwarê çapqinê çolî be e

lomekarno loma mekin
gava navê Tawîr begê lewend dibîsê
di ber ra derrê û tê û dime e

di ber ra derê û tê kûr mestî serxo e

Law law law law .. serxo e
Law law law law.. serxo e

vê ca Lewendê bankir go :

law sazbedo dilê mi hanî
law a i qo dilê mê hanî
te vê meqama ji ku hanî

Tawir beg

darî tembûrê dihejînê
û li pî ê derrê û tê
dibê law pa awo
dilê mi hanî

mi vê meqama
ji kirîfê te hilhanî

lê lê lê lê.. lê yarê

Xatûnê ..
sermestê ..
yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide bayê êvarê

Lewendê bankir go :

law a iqo dilê mi weye
va êvare ne sibeye

bila ji kul û kedera dilê
min û te ra
bilbil bixwanda
li darika qebe ye

tu digerê li darî dinyê ye

li çerx û felekê te haj
Tawîr begê lawkê lawîn tine ye

law sazbedo

bike û bilezîne
qeda û belê xwe bi min xîne

xêr û xebera
Tawîr begê lawkê lawîn
bi min gîne

çel û yek rojin
Lewendê li kela Mêrdîne
va govend û dîlanê digerîne

êmakî xwe qandî çel û yek rojê kirîfan ji min bistîne

bila di pê Tawîr begê lawîn ra
yar kûr bibe û nemîne

Xatûnê..
sermestê..

yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide bayê êvarê

Tawîr begê bankir go
Lê yarê...
lê lê lê lê lê lê ... lê
û lê lê lê lê lê ... yarê

te ez çima peya hê tim
li binyana zinarê

li kelekela germa havînê
li serma êvarê

li de ta Mêrdînê
lê yarê ..
li ser kaniya qerarê

li ûna çapqinê çolî be
te ji mi ra girêdida
bergîrê seqê û midarê

lê yarê
te ez kirim kirasê êsîrîyê
te berdeha çêpçûn
li mil û pêsîrê min da
mi daxist bajarê Mêrdînê
li satisiltan bazarê

lê yarê çima te ez ne ku tim
bi zendêd badayî li ser destêd xwe ne u tim
te xêre li ser kaniya qerarê ez peya hê tim

te ez kirim taya serma êvarê li
ber tîna germa biharê te ez bra tim
bi vê e q û sewdayê te ku tim
salik û e mihene
te kela Rewendê
hê tî vê eze û mixtarê

lê yarê bila bi bîra te werê
gava ez û te va li serê
kela Mêrdînê
bi hev ra diketin meraqa dila li siya zinarê

lê yarê serxo ê mey û erab vexwarê

lê lê lê lê..lê yarê
le lê lê lê lê.. yarê

lê yarê ez nemînim vê carê

Xatûnê..
Sermestê..
yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin are
têr nebûm ez ji balav û dindarê
hele yarê bide bayê êvarê

Lewendê bi dengê bankir go :
law sazbeno

te li wî girî li wî ristî
mi li vî girî li vî ristî

bila bi ewite
mala Tawîr begê lawîn
agirê dara

bi dil û cîgerê mi xistî
tawîr begê lawîn ê a zirav berda
hinava min
li min re kirine hestî

salik û e mihene
ez nizanim
vê ra yarim
ez nizanim
bi dergistî

law sazbedo ka ji mira bêje
te va meqama
ji ku haniye
law law law law
ji kê bihîstî

Tawîr begê go:
Mi vê meqama ji sazbedê
te biriye
ji kirîfê te bihîstî

Xatûnê..
Sermestê..
yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide bayê êvarê

Tawîr begê bi dengekî bankir go:

lê lê dînê dîwanê
lê zalimê dîwanê
bejn û balava te

ji mi ra zirave ji tayê rihanê
bila xuva bihata li kuderê
ne li kuderê
li serê kela Mêrdînê
li pî a eywanê

ji berê pa ê da dibên
kes bi derdî kesî nizanê

pi tî salekê û e miha
tu îro dipirsê li halê
Tawîr begê
lawkê lawîn
mîrê kela Rewanê

lê serxo ê sergiranê

Tawîr begê bi dengikî bankir go:

lê yarê tu yarka mina li kursî

tu dosta mina li kursî

tu ji Xwedê rebî alemê na tirsî

ji yekê bi tenê na tirsî

di istiyê te da gerdenê zêrê xursî

lê yarê li xursî

çiqas rojê Xwedê hene
te xwe berdida
serê govend û dîlanê
bi du desmala dîreqşî

Tu xêre

li halê
Tawîr begê lawkê lawîn
sîwarê çapqinê çolî be î
na pirsî

Tawîr begê bi dengekî bankir go:
lê yarê dilê mi dîne

ji kula da bi kule
ji birîna da bi birîne

kul û birîn li mi zengirîne

ji gavî çû da
tu xêre çavêd xwe
li Tawîr begê lawkê lawîn
hilnîne

lê yarê dilî mi deme

bejn û balava te ji mi ra
zirave li çerkeme

bihara rengîn xwe hukumkirî
gul û çiçeka xwe dane ceme

tu dipirsê li halê
Tawîr begê lawîn
Tawîr begê lawîn
lê yarê ez bi xwe me

Xatûnê..
Sermestê..
yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr ne bûm ez ji balav û dîndarê
hele yarê bide bayê êvarê

Lewendê ban kir go:
Lo mîvano dilê mi dêre

bila rojek hilhata
ji mala Xwedê
bida serê kela Mêrdînê
pozê zinêre

bila lêxista li kela Mêrdînê
li serê nedêre

di ser ra yayle û zozane
ivan û gavana
xwe dane ser pesêre

di ser ra pezê mê inî di
bini ra pezê nêrî lê diçêre

Lo mîro tu hatî
li ser her du çava
hatina te bi xêre

Law law law law.. bi xêre
Law law law law.. bi xêre

Erê Lewend pa a dike û dilezîne

bi destêd sazband digre
ji dîlanê dik îne

ji govend û dîlanê bi der tîne

dibê :
Bila yar kûr bibê nemîne

law law law law .. nemîne
law law law law .. nemîne

bila çavê mi
Tawîr begê lawîn
di kirasî êsîriyê da nebîne

Tawîr beg
destê xwe davê destêd bi hene
û zendêd bi çîne

û got :
Ji berî tu miraz û dîlegê xwe
bi min ra bibîne

bi mi de salixa
çapqînê çolî be î gergîne

de were min û Lewend pa a
nikane çavê xwe
li mîrê kela Rewendê
hilîne

law law law law .. hilîne
law law law law .. hilîne

Xatûnê ..
sermestê ..
yarê te mey vexwarê
vere îne biskê xwe yên bin arê
têr nebûm ez ji balav û dîndare
hele yarê bide bayê êvarê

Piştî Tawîr beg bi Lewendê re dibê ezim lawkê lawîn mîrê kela Rewendê sîwarê çapqînê çolî beşî gergîn , Lewend paşa lê dikevê gûmanê ! nizanê raste va Tawîr bege ! nizanê vire .Tawîr beg jê ra dibêje : ger tu ji min bawer nakê ezê herrim xwe bişom û cil û qerpalê êsîriyê û kirîfa ji xwe dînim û werim ba te, tê bibîne ez lawkê lawînim, piştî Tawîr beg tê bi cilê beg û mîra Lewend paşa wî nasdike û dibê: de were tu lawkê lawîne, xudanê kela Rewendê ye, ez dixwazim tu bi mi ra bibîne bext û miraza û em bi hev ra têkevin eşq û meraqê dila. Tawîr beg lê vedigerîne û dibê : Ez tu carî bi te ra nakevim bext û miraz û dilega, heya tu ji mi ra nîne çapqînê çolî beşî gergîn . wê çaxê Lewendê ji Tawîr begê ra çêroka pîra sofi û cariya kinik û kuştina çêpqin xeber da, li wir tê bîra Tawîr begê lawîn, çawa ji bavê xwe bîst ko hevalê çêpqin birin satibazarê li bajarê Mêrdînê firotin û bi Lewendê ra dibê: Ka em derên nav bajarî we yî Mêrdînê û li hevalê çêpqin bigerin. Lewend bi rêdikeve û Tawîr beg li pê Lewendê dimeşe li nav bajarê Mêrdînê Tawîr beg rastî tembûrcî tê dibê : Ji mi ra bêje ji zemanekî dûr da du canî ji pêlên deryê derketin û yek ji wan li bajarî we yî Mêrdînê hate firotan ma kî xudanê wî ye û em ê li ku bibînin tembûrcî go: ew hespê tu lê dipirse li cem Nûrî begê yawidî ye î kirî binerdikê di piş heft deriya da ye , min bi xwe ji wî ra deriyê heyştan çêkirî herin tewlêd hespa li cem Nûrî begê û têkevin nav baxçê wî deriyekî bi tenê di ortê bêxçeda heye, çapqînê tu dixwazê di piş wî derî daye .

Lewend paşa li pişa Tawîr begê meşî û çûn cem Nûrî begê yawidî yawidî bi Lewendê ra go: Tu bi xêr hat paşawo ma çima em te nabînin weke bavê te ? yê herdem pirsra mi dikir! bavê te dostekî rind bû bi mira, keremke paşayê kela Mêrdînê tu bi xêr hat.

Lewendê vê ra got : Em hatine ba te ji bo têkevin tewlê hespa û baxçî te bibînin. Yawidî got: Keremkin rê

vekiriye yawidî deriyê şeş tewla vedikê û Lewend û Tawîr begê hemî hespê wî dibînin û sedikîn, ji wê û bi şûn da vê ra dibên : Tê ji me ra deriyê heftan vekê, yawidî derî vedikê Lewend û Tawîr begê dibînin baxçakî mezin di piş wê derî da heye hemî dar û meywene, Lewend û Tawîr begê di nav ra digerin û dibînin di ortê bêxçe de deriyekî din heye Lewend dibê : Nûrî beg ma ev çiyê ? Nûrî dibê : Ev maxek di binerdê daye zarokî min biçûk heye li ber dilî min pir şêrîne, çiçekek xwe tê da çandiye û ser lê girtiye, Lewend paşa dibê: Ka em kê vê çiçekê bibînin. yawidî dibê: Ev binerde û ji mêj me ve ne kirî hulm û bihnê ne xweş jê tê . Lewend paşa dibê : çênabe ko em vê çiçekê ne bînin rê ji yawdî ra namînê û derî jê ra vedikê, Lewend paşa û Tawîr begê lawîn dikevin hundir wê max ê û çêpçin dibînin tê da girêdayiye. Lewend paşa bi yawidî ra dibê : Ez kê vê hespî ji te bikirim, ma bihayê wî çiqase Yawidî dibê : Bihayê vî li dinya yê qet nîne, ne bi mal û ne bi zêr ez vê hespî nafroşim. Lewend paşa bi yawidî ra dibê : Ev mîvanî min pir meraqê lênûştina vê hespî dikê, eger tu nafroşê ka berdeh û zînê lêke bila carekê dudiya di nav baxçî te ra herê werê ji bo ew meraqa vê ra nemînê.

Yawidî razî dibê, lê zanê kes nikanê sîwar be li vê hespî û bawar nekir hesp bêlê kes lê sîwar bê, zîn û berdeha çapçinê Tawîr begê anî û li çêpçin kir, wê çaxê Tawîr beg bi zîn û berdehê çêpçin sîwar bû carekê di nav bêxçe ra gerî gihîşt cem Lewendê û vê carê Lewendê xwe havêt tergiya Tawîr begê, Tawîr begê zengiyek da çêpçin ji nav bêxçe biderket û xwe di ser tewlê ra avêtin û bi vê awayî çapçin ji yawidî standin û birin û çûn.

* * *

Lewendê bankir go :
çi kanîka li nav reza

ji hesreta min
û Tawîr begê ra
avê tê diza

Xwedê ez kirim
sîwarê çapqûn
hespê beza

Xwedê de bikê
mirazê me herd
a iq û bilmeza

dibê.. lê lê lê lê lê
û lê lê lê lê.. yarê

Erê Tawîr begê lawîn
dikê û dilezîne

bi qal û qanada
e q û meraqa dila digrê
li tergiya xwe datîne

erê Kurdino
gaza yaqûbê hiltîne

digîne Kela Rewendê
Lewendê li wir datîne

heft roj û heft eva
def û dîlanê
ji xwe û Lewendê ra
digerîne
"xwedîbenda" xwe lê datîne
vê ra dîleg û e qa dila dikê

Û
Mirazê xwe dibîne



Dastana me dawî hat li vê teni tê
Xwedê bikê mirazê miraz xwaza gi tê
